**Di sala pandemîyê ango sala 2020an de**

**ÇEND KOVAR BI ÇEND NIVÎSAN WEŞIYAN**

Kovargerî karekî bi zehmet e, ji ber ku bi demê ve girêdayî ye û ji bo amadekirina kovarekê gelek kes (edîtor, nivîskar, mizanpaj û hwd.) ked û emekê didin û kovar ji gelek qonaxan ve derbas dibe. Ji ber pir sedeman hin caran kovar di demên xwe de dernakevin an ji ber hin pirsgirêkan dawî li weşanên xwe tînin.

Me wek Koma Kovargerên Kurd meraq kir, gelo di sala pandemîyê de ango sala 2020an bo kovargerîya Kurdî çawa derbas bû? Me da pey vê pirsê û me hin daneyên jimareyên kovarên ku di sala 2020an de hatine weşandin dan ber hev. Daneyên me ew bûn ku di sala 2020an de çend kovarên Kurdî çend jimar weşandine, di her jimarê de çend nivîs bi zimanê Kurdî (Kurmancî, Soranî û Zazakî) ne, çend nivîs bi zimanên biyanî ne.

Di vê xebatê de ji ber hin sedeman me mecbûr qada xwe ya xebatê bes bi hin kovarên li bakurê Kurdistanê sînordar kir.

Metoda xebata me ev bû; me bi nivîseke ku tê de pirsên jorîn hebûn ji berpirsên kovaran re şandin û li gorî bersiv û agahiyên ku wan dan me ev rapor amade kir. Jixwe îdiayeke me nîn e ku me bi vê xebatê cih daye hemû kovarên li bakur. Lewra hin kovaran bersiv nedan, hin kovar ji ber pandemiyê neweşiyan an jî êdî dawî li weşanên xwe anîn.

Di vê raporê de em ê pêşî nameya ku me daxwaza agahîxwestinê ji kovaran kiribû parve bikin, piştre bi tabloyekê daneyên ku me bidest xistine yek bi yek em ê destnîşan bikin.

Li gorî daneyên di destên me de di sala 2020an de 19 kovarên Kurdî 45 jimar weşandine. Di wan jimaran de bi tevahî 827 nivîs hatine weşandin. Bi kurtasî ji wan nivîsan; 617 heb bi Kurmancî, 47 heb bi Zazakî, 15 heb jî bi Soranî, bi giştî 679 nivîsên bi Kurdî hatine weşandin. Her wiha, 142 nivîs bi Tirkî, 5 nivîs bi Îngîlîzî, nivîsek bi Fransî, nivîsek bi Farisî, nivîsek bi Erebî, bi tevahî 150 nivîs bi zimanên biyanî hatine weşandin.

De kerem bikin daneyên me dan hev li jêr in.

**NAMEYA AGAHÎXWESTINÊ:**

Merheba dost û hevalên hêja,

Wek hûn dizanin li ser kovarên Kurdî lêkolîn kêm in. Kêm kes li ser kovarên Kurdî dixebitin.

Bi vê minasebetê em çend kovarên ku weşana bi zimanê Kurdî dikin, ji ber şert û mercên pandemiyê di platforma dîjîtal da em hatin cem hev û me bi navê "Koma Kovargerên Kurd" înîsîyatîfek ava kir. Lê ji ber şert û mercên şewbê însîyatîfa me hêj bi temamî nehatiye damezirandin. Ji loma jî me hêj damezrandina xwe îlan nekiriye. Lê belê ev demekî ye me li ser kovarên Kurdî dest bi hin xebatan kiriye. Niha xebatekê ku me daye pêşiya xwe jî ev e; em dixwazin di dawîya sala 2020an de li ser weşandina jimarên kovarên Kurdî bi dane û hûrgilîyan em tabloya salekê derxin meydanê.

Di dawîya sala 2020an de me biryar da ku em van daneyên kovaran bidin ber hev;

1. Îsal çend Kovar weşiyan?
2. Kîjan kovar çiqas jimar weşandin?
3. Di her jimarê da zaraveyên Kurdî û zimanên din çiqas cih girtin û çend heb nivîs weşiyan?

Ev dane bo kovarên Kurdî helbet kêm in, lê em dixwazin îsal bi van daneyan raporekê biweşînin. Lê em hêvîdar in di sal û wextên bê da em karibin ji gelek aliyan ve li ser kovar û kovargerîya Kurdî bixebitin û krîtîkên cuda bikin.

Bi vê bîr û baweriyê em ji we hêvî dikin ku hûn li forma jêrê agahiyên derbarê jimarên sala 2020an a kovara xwe binivîsînin û di vê xebatê da bibin alîkarê me.

Bimînin di nav xêr û xweşiyê de.

*Koma Kovargerên Kurd*

**Kunyeya Kovarê:**

**Têkilî:**

**Derbarê Kovarê de:**

Ji keram xwe li tabloya jêrê tenê çend nivîs û bi kîjan zimanî hatine nivîsîn binivîsin. Ne hewceyê navên nivîsan û hurguliyên din binivîsin tenê jimar bes in.

| Hejmara Kovarê | Dema Weşanê | Tevahî Çend Nivîs | Kurdî | | | Tirkî | Îngîlîzî | Zimanê Din |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | Kurmancî | Soranî | Zazakî | | | |
| | | | | | | | | |
| | | | | | | | | |
| | | | | | | | | |

| | | Hejmara Kovarê | Dema Weşanê | Tevahî Çend Nivîs | Kurdî | | | Tirkî | Îngîlîzî | Fransî | Farisî | Erebi |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | Kurmancî | Soranî | Zazakî | | | | | |
| 1 | Bar | 4 | Havîn 2020 | 19 | 18 | - | 1 | - | - | - | - | - |
| 2 | Çandname | 2 | 15.05.2020 | 19 | 19 | - | - | - | - | - | - | - |
| 3 | Çandname | 3 | 1.10.2020 | 12 | 12 | - | - | - | - | - | - | - |
| 4 | Deng | 117 | Adar 2020 | 14 | 5 | - | - | 9 | - | - | - | - |
| 5 | Deng | 118 | Heziran 2020 | 14 | 4 | - | - | 10 | - | - | - | - |
| 6 | Deng | 119 | îlon 2020 | 13 | 4 | - | - | 9 | - | - | - | - |
| 7 | Deng | 120 | Çile 2020 | 15 | 6 | - | - | 9 | - | - | - | - |
| 8 | Dilop | 12 | Rêbendan-Sibat, 2020 | 24 | 10 | - | 2 | 12 | - | - | - | - |
| 9 | Dilop | 13 | Adar-Nîsan, 2020 | 26 | 13 | - | - | 13 | - | - | - | - |
| 10 | Dilop | 14 | Gulan-Hezîran, 2020 | 23 | 12 | - | - | 11 | - | - | - | - |
| 11 | Dilop | 15 | Temûz-Tebax, 2020 | 22 | 11 | - | - | 11 | - | - | - | - |
| 12 | Dilop | 16 | Îlon-Cotmeh, 2020 | 24 | 11 | - | - | 13 | - | - | - | - |
| 13 | Dilop | 17 | Mijdar-Berfanbar, 2020 | 22 | 8 | - | - | 14 | - | - | - | - |
| 14 | Folklora Me | 4 | Zivistan | 25 | 22 | - | 3 | - | - | - | - | - |
| 15 | Folklora Me | 5 | Bihar | 25 | 22 | - | 3 | - | - | - | - | - |
| 16 | Folklora Me | 6 | Havîn | 23 | 21 | - | 2 | - | - | - | - | - |
| 17 | Folklora Me | 7 | Payîz | 21 | 19 | - | 2 | - | - | - | - | - |
| 18 | Folkor û Ziman | 1 | 30 Nîsan 2020 | 9 | 6 | 1 | 2 | - | - | - | - | - |
| 19 | Folkor û Ziman | 2 | 31 Çirîya Pêşîn 2020 | 11 | 7 | - | 2 | - | - | - | - | - |
| 20 | Kubar | 3 | 2020 | 38 | 38 | - | - | - | - | - | - | - |
| 21 | Kürd Araştırmaları | 2 | 2020 | 13 | 1 | 1 | - | 9 | 1 | - | 1 | - |
| 22 | Kürd Araştırmaları | 3 | 2020 | 12 | 2 | - | - | 9 | 1 | - | - | - |
| 23 | Kürd Araştırmaları | 4 | 2020 | 13 | 2 | - | - | 10 | 1 | - | - | - |
| 24 | Kurdiname | 2 | Bihar 2020 | 9 | 7 | 1 | - | | 2 | - | - | - |
| 25 | Kurdiname | 3 | Payiz 2020 | 10 | 8 | 1 | 1 | - | - | - | - | - |
| 26 | Kurd'Înalco | 2 | Bihar 2020 | 20 | 15 | 4 | 1 | - | - | 1 | - | - |
| 27 | Kurdiyat | 1 | Heziran-2020 | 5 | 5 | - | - | | - | - | - | - |
| 28 | Kurdiyat | 2 | Kanun-2020 | 8 | 6 | - | - | 2 | - | - | - | 1 |

| | | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 29 | Laser | 6 | 2020 | 31 | 20 | - | 11 | - | - | - | - | - |
| 30 | Nûbihar | 150 | Sibat 2020 | 36 | 35 | - | 1 | - | - | - | - | - |
| 31 | Nûbihar | 151 | Gulan 2020 | 39 | 39 | - | - | - | - | - | - | - |
| 32 | Nûbihar | 152 | Tebax 2020 | 33 | 33 | - | 1 | - | - | - | - | - |
| 33 | Nûbihar | 153 | Mijdar 2020 | 33 | 30 | - | 3 | - | - | - | - | - |
| 34 | PopKurd | 6 | Oca.20 | 13 | 13 | - | - | - | - | - | - | - |
| 35 | PopKurd | 7 | May.20 | 13 | 13 | - | - | - | - | - | - | - |
| 36 | PopKurd | 8 | Eyl.20 | 13 | 12 | - | 1 | - | - | - | - | - |
| 37 | Psychology Kurdî | 10 | Oca.20 | 19 | 17 | - | 2 | - | - | - | - | - |
| 38 | Psychology Kurdî | taybet | May.20 | 11 | 10 | - | 1 | - | - | - | - | - |
| 39 | Psychology Kurdî | 11 | Eyl.20 | 17 | 15 | - | 2 | - | - | - | - | - |
| 40 | Sînemaya Serbixwe | 3 | Salê du caran | 30 | 27 | 1 | 1 | 1 | - | - | - | - |
| 41 | Sînemaya Serbixwe | 4 | Salê du caran | 9 | 8 | - | 1 | | - | - | - | - |
| 42 | Temaşe | 1 | Demsalî | 19 | 17 | 1 | 1 | - | - | - | - | - |
| 43 | Temaşe | 2 | Demsalî | 21 | 15 | 3 | 3 | - | - | - | - | - |
| 44 | Vejîn | 7 | 15.05.2020 | 10 | 8 | 1 | 1 | - | - | - | - | - |
| 45 | Zend | 27 | 2020 | 10 | 9 | 1 | | - | - | - | - | - |
| | | | | | 617 | 15 | 47 | 142 | 5 | 1 | 1 | 1 |
| | | | | 827 | 679 | 150 | | | | | | |

**Kunyeya Kovarê:**

**Nav:** Bar (Wêje, Werger, Rexne)

**Derbarê Kovarê de:** Bi helbest, werger û nivîsên çi rexneyî çi jî danasînî yên li ser wêjeyê weşana xwe didomîne.

| **Hejmara Kovarê** | **Dema Weşanê** | **Tevahî Çend Nivîs** | **Kurdî** | | | **Tirkî** | **Îngîlîzî** | **Zimanê Din** |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | **Kurmancî** | **Soranî** | **Zazakî** | | | |
| 4 | 28.07.2020 | 19 | 18 | 1 | | | | |

**Kunyeya Kovarê:**

**Nav:** Çadnname

**Derbarê Kovarê de:** Li ser çand û jiyanê weşanê dike.  Malpera wê jî heye.

| Hejmara Kovarê | Dema Weşanê | Tevahî Çend Nivîs | Kurdî | | | Tirkî | Îngîlîzî | Zimanê Din |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | Kurmancî | Soranî | Zazakî | | | |
| 2 | 15.05.2020 | 19 | 19 | | | | | |
| 3 | 01.10.2020 | 12 | 12 | | | | | |

**Kunyeya Kovarê**:

**Nav:** Deng

**Derbarê Kovarê de**: Kovara Dengê di sala 1989an da li İstenbulê di çaroveya Weşanên Dengê da dest bi weşana xwe kir. Ev bû sî sal e berdewam derdikeve. Kovara Dengê bi kurdî û tirkî derdikeve. Carna nivîsê zazakî jî tê da derdikevin. Bi taybetî li ser pirsa Kurd hur dibe. Her wisa jî derbarên pirsa demokrasiye, pirsa jinan, ciwanan, aborîyê, bêkarîyê û wekî din cîh dide maqale, lêkolîn û hevpeyvînan. 2020'da ji ber koronayê her hejmar 1000 heb çapbûn. Heta nıha 120 hejmar derketine.

| Hejmara Kovarê | Dema Weşanê | Tevahî Çend Nivîs | Kurdî | | | Tirkî | Îngîlîzî | Zimanê Din |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | Kurmancî | Soranî | Zazakî | | | |
| 117 | Adar 2020 | 14 | 5 | | | 9 | | |
| 118 | Heziran 2020 | 14 | 4 | | | 10 | | |
| 119 | îlon 2020 | 13 | 4 | | | 9 | | |
| 120 | Çile 2020 | 15 | 6 | | | 9 | | |

**Kunyeya Kovarê:**

**Nav:** Dilop

**Derbarê Kovarê de:** Kovara du mehî ya çand, huner û polîtîkayê

| Hejmara Kovarê | Dema Weşanê | TevahîÇendNivîs | Kurdî | | | Tirkî |
|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | Kurmancî | Soranî | Zazakî | |
| 1 | Adar-Nîsan, 2018 | 24 | 13 | | | 11 |
| 2 | Gulan-Hezîran, 2018 | 27 | 16 | | | 11 |
| 3 | Temûz-Tebax, 2018 | 27 | 18 | | | 9 |
| 4 | Îlon-Cotmeh, 2018 | 26 | 14 | | | 12 |
| 5 | Mijdar-Berfanbar, 2018 | 28 | 16 | | 1 | 11 |
| 6 | Rêbendan-Sibat, 2019 | 26 | 16 | | | 10 |
| 7 | Adar-Nîsan, 2019 | 26 | 12 | | 1 | 13 |
| 8 | Gulan-Hezîran, 2019 | 26 | 13 | | | 13 |
| 9 | Temûz-Tebax, 2019 | 28 | 15 | | | 13 |
| 10 | Îlon-Cotmeh, 2019 | 22 | 12 | | 1 | 9 |
| 11 | Mijdar-Berfanbar, 2019 | 22 | 8 | | 1 | 13 |
| 12 | Rêbendan-Sibat, 2020 | 24 | 10 | | 2 | 12 |
| 13 | Adar-Nîsan, 2020 | 26 | 13 | | | 13 |
| 14 | Gulan-Hezîran, 2020 | 23 | 12 | | | 11 |
| 15 | Temûz-Tebax, 2020 | 22 | 11 | | | 11 |
| 16 | Îlon-Cotmeh, 2020 | 24 | 11 | | | 13 |
| 17 | Mijdar-Berfanbar, 2020 | 22 | 8 | | | 14 |
| 18 | Rêbendan-Sibat, 2021 | 22 | 11 | | 1 | 10 |

**Kunyeya Kovarê:**

**Nav:** Fêrname

**Derbarê Kovarê de:** Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê di sala 2014an de ji bo mamoste û şagirtên xwe kovareke bi navê Fêrname yê derdixe. Di vê kovarê de di gel berhem û nivîsên xwendekar û mamosteyan, nivîsên der barê çand û hunera kurdî jî cih digirin. Her wiha di kovarê de di gel hîndarîyên fêrkirina kurdî, der barê rê û rêbazên fêrkirinê jî nivîs cih digire. Kesên ku nû hînî kurdî dibin dikarin bi alîkarîya vê kovarê xwendina xwe bi pêş bixin û çand û wêjeya kurdî nas bikin. Mijarên mîna remildank û xaçepirs jî di kovara Fêrnameyê de cih digirin. Nivîsên bi her sê zaravayên kurdî (kirmanckî, kurmancîya jorîn û kurmancîya jêrîn) di kovarê hene. Mamoste û xwendekarên kurdî dikarin ji vê kovarê sûdê wergirin, her wiha dikarin bi nivîsên xwe jî piştevanîya kovarê bikin. Heta niha 4 hejmarên kovara Fêrnameyê derketine. Piştî hejmara 4an formata Fêrnameyê hate guhertin û ji niha û pê ve tenê dê metnên xwendinê tê de hebin li gorî asta yekem, duyem û sêyem. Fêrname salane 2 hejmar jê derdikevin. Hejmareke wê biharê û ya din jî payizê tê derxistin.

| Hejmara Kovarê | Dema Weşanê | Tevahî Çend Nivîs | Kurdî | | | Tirkî | Îngîlîzî | Zimanê Din |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | Kurmancî | Soranî | Zazakî | | | |
| - | - | - | - | - | | | | |

**Kunyeya Kovarê:**

**Nav:** Folkor û Ziman

**Derbarê Kovarê de:** Di çerçoveya folkora kurdî da mijarên wekî teorîyên folklorê, edebîyata gelêrî, adet û tore, bîr û bawerîyên gelêrî, zanyarîyên gelêrî, ferhenga herêmî, têgehên folklora kurdî, xebatên meydanî û her wiha lêkolîn û nivîsên derbarê etnografyaya kurdî da û hwd dê bihên weşandin. Di çerçoveya xebatên zimanî da jî dê her cure mijarên têkildarî fonolojî, morfolojî, sentaks, morfosentaks, zimannasîya civakî (sosyo-lînguîstîk), zimanzanîya îranî hwd cih bigirin. Di kovarê da dê nivîsên di forma gotar, werger, danasîna sempozyum, pirtûk û tezan da jî biweşin. Di bin banê Weqfa Mezopotamyayê (Dîyarbekir) da tê weşandin.

| Hejmara Kovarê | Dema Weşanê | Tevahî Çend Nivîs | Kurdî | | | Tirkî | Îngîlîzî | Zimanê Din |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | Kurmancî | Soranî | Zazakî | | | |
| 1 | 30 Nîsan 2020 | 9 | 6 | 1 | 2 | - | - | - |
| 2 | 31 Çirîya Pêşîn 2020 | 11 | 7 | - | 2 | - | - | - |

**Kunyeya Kovarê:**

**Navê kovarê:** Folklora Me

**Derbarê Kovarê de:** Kovareka folklorî ye, temaya wê folklor e. Hejmara 1. di 21.03.2019ê da derket. Heta vêga 7 hejmar çap bûne. Hejmara 8. tê amadekirin. Cureyên nivîsên bi piranî ev in: berhevkarî, gotarên li ser folklorê û keresteyên folklorê. Nirxandina pirtûkên folklorê. Danasîna pirtûkên folklorê. Xaçepirsên derbarê folklorê da.

| Hejmara Kovarê | Dema Weşanê | Tevahî Çend Nivîs | Kurdî | | | Tirkî | Îngîlîzî | Zimanê Din |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | Kurmancî | Soranî | Zazakî | | | |
| Hejmara 4 | Zivistan | 25 | 22 | - | 3 | - | - | - |
| Hejmara 5 | Bihar | 25 | 22 | - | 3 | - | - | - |
| Hejmara 6 | Havîn | 23 | 21 | - | 2 | - | - | - |
| Hejmara 7 | Payîz | 21 | 19 | - | 2 | - | - | - |

**Kunyeya Kovarê:**

**Nav:** Kubar

**Derbarê Kovarê de:** Kovara Kubarê kovareke li ser mode, tenduristî, zayendî yanê li derheqê mijarên girêdayî jiyanê ye. Li ser înternetê  tê weşandin.

| Hejmara Kovarê | Dema Weşanê | Tevahî Çend Nivîs | Kurdî | | | Tirkî | Îngîlîzî | Zimanê Din |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | Kurmancî | Soranî | Zazakî | | | |
| 3 | 2020 | 38 | 38 | | | | | |

**Kunyeya Kovarê:**

**Nav:** Kurd Araştırmaları (Lêkolînên Kurdî)

**Derbarê Kovarê de:** Kovar bi gelek zimanan li ser çand, dîrok û mijarên civakî yên di derbarê kurdan de weşanê dike.

| Hejmara Kovarê | Dema Weşanê | Tevahî Çend Nivîs | Kurdî | | | Tirkî | Îngîlîzî | Zimanê Din |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | Kurmancî | Soranî | Zazakî | | | |
| 1 | 2019 | 12 | 2 | 1 | | 8 | 1 | |
| 2 | 2020 | 13 | 1 | 1 | | 9 | 1 | 1 |
| 3 | 2020 | 12 | 2 | | | 9 | 1 | |
| 4 | 2020 | 13 | 2 | | | 10 | 1 | |

**Kunyeya Kovarê:**

**Nav:** Kurd'Înalco

**Derbarê Kovarê de:** Kovara Kurd'Înalcoyê bi xebata kurdên xwendekar derdiçe, ku li Parîsê dixwînin. Ev kovar, li dîyasporayê derdiçe, ji ber wê yekê taybetiyeke wê heye. Kesên ku di kovarê de dinivîsin, li gorî lêkolîn û hestîyarîya dûrbûna ji Welat dinivîsin. Ji ber vê yekê nikare bikeve nav beşa kovarên Bakûre Kurdistanê, lê belê cihê wê di nav beşa kovarên kurdî de ye.

| Hejmara Kovarê | Dema Weşanê | Tevahî Çend Nivîs | Kurdî | | | Tirkî | Îngîlîzî | Fransî |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | Kurmancî | Soranî | Zazakî | | | |
| 3 | Bihar 2021 | 20 | 15 | 4 | 1 | | | 1 |

**Kunyeya Kovarê:**

**Nav:** Kurdiname

**Derbarê Kovarê de:** Ji alîyê mamosteyê beşa Kurdî ya Zanîngeha Dicle'yê Osman ASLANOĞLU va hat destpêkirin û tê meşandin. Kovara Kurdiname'yê li ser ziman, wêje, çand û dîroka Kurdî ye. Kovar akademîk û navnetewî ye. Kovar online e û li ser malpereke fermî a kovaran **dergipark.org.tr** weşana xwe dike. Hejmarên kovarê salê du caran bihar û payîzê derdikevin. Ger hewcedarî hebe jimarên zêde jî dikarin werin derxistin. Gotarên lêkolînî, werger û nirxandina pirtûkan tên qebûlkirin. Gotarên bi zimanên Kurdî(hemû zarava), Tirkî, Îngîlîzî, Farsî, Erebî tên weşandin. Gotar herî kêm ji alîyê du hakemên kor va tên nirxandin. Gotarên kovarê li ser rêbaza APAyê tên nivîsandin. Weşandina gotaran bê pere ye. Ji zanîngehên cuda yên li Tirkiyeyê û li derva gelek mamoste di lîsteya hakemtîyê û şêwirînê da cih digirin.

| **Hejmara Kovarê** | **Dema Weşanê** | **Tevahî Çend Nivîs** | **Kurdî** | | | **Tirkî** | **Îngîlîzî** | **Zimanê Din** |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | **Kurmancî** | **Soranî** | **Zazakî** | | | |
| 1 | Payîz 2019 | 6 | 6 | - | - | - | | - |
| 2 | Bihar 2020 | 9 | 7 | 1 | | | 2 | |
| 3 | Payiz 2020 | 10 | 8 | 1 | 1 | - | - | - |

**Kunyeya Kovarê:**

**Nav:** Kurdiyat

**Derbarê Kovarê de:** Ji keram xwe li tabloya jêrê tenê çend nivîs û bi kîjan zimanî hatine nivîsîn binivîsin. Ne hewceyê navên nivîsan û hurguliyên din binivîsin tenê jimar bes in.

| Hejmara Kovarê | Dema Weşanê | Tevahî Çend Nivîs | Kurdî | | | Tirkî | Îngîlîzî | Zimanê Din |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | Kurmancî | Soranî | Zazakî | | | |
| 1 | Heziran-2020 | 5 | 5 | | | | | |
| 2 | Kanun-2020 | 8 | 6 | | | 2 | | 1 |

**Kunyeya Kovarê:**
**Nav:** Laser

**Derbarê Kovarê de:** Kovara Laserê ji alîyê xwendekarên Zanîngeha Çewlîgê, salê carekê bi kurmancî û zazakî tê amadekirin. Ji keram xwe li tabloya jêrê tenê çend nivîs û bi kîjan zimanî hatine nivîsîn binivîsin. Ne hewceyê navên nivîsan û hurguliyên din binivîsin tenê jimar bes in.

| Hejmara Kovarê | Dema Weşanê | Tevahî Çend Nivîs | Kurdî | | | Tirkî | Îngîlîzî | Zimanê Din |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | Kurmancî | Soranî | Zazakî | | | |
| 6 | 2020 | 31 | 20 | - | 11 | - | - | - |

**Kunyeya Kovarê:**

**Nav:** Nûbihar

**Derbarê Kovarê de:** Nûbihar sê mehan carekê derdikeve. Sala 1992yan, di meha Çiriya Pêşin/Cotmehê de dest bi weşanê kiriye. Heta sala 2000î mehane derketiye. 2002yan de du salan navber daye weşana xwe, ji 2002yan pêve weka sêmehane weşana xwe dewam dike. Bêhtir nivîsên edebî (helbest, çîrok, ceribibîn) û nivîsên lêkolînî diweşîne.

| Hejmara Kovarê | Dema Weşanê | Tevahî Çend Nivîs | Kurdî | | | Tirkî | Îngîlîzî | Zimanê Din |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | Kurmancî | Soranî | Zazakî | | | |
| 150 | Sibat | 36 | 35 | - | 1 | - | - | - |
| 151 | Gulan | 39 | 39 | - | - | - | - | - |
| 152 | Tebax | 33 | 33 | - | 1 | - | - | - |
| 153 | Midar | 33 | 30 | - | 3 | - | - | - |

**Kunyeya Kovarê:**

**Nav:** POPKURD

**Derbarê Kovarê de:** Kovara me kovareke aktuel û li ser mijarên sînema, muzîk, şano, edebiyat, magazîn û mîzahê radiweste. Di Gulana 2018an da dest bi weşana xwe ya dîjîtal kir û hejmara dawî ya 8an jî di Îlona 2020an da hate weşandin. Kovara me perîyodîk nîne û kengê amade bû der diçe. Di sala 2020an da 3 hejmar derketin. Hejmarên 6-7 û 8an me weşandin.

| Hejmara Kovarê | Dema Weşanê | Tevahî Çend Nivîs | Kurdî | | | Tirkî | Îngîlîzî | Zimanê Din |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | Kurmancî | Soranî | Zazakî | | | |
| PopKurd 6 | 01/2020 | 13 | 13 | | | | | |
| PopKurd 7 | 05/2020 | 13 | 13 | | | | | |
| PopKurd 8 | 09/2020 | 13 | 12 | | 1 | | | |

**Kunyeya Kovarê**

**Nav:** Psychology Kurdî

**Derbarê Kovarê de:** Kovara Psychology Kurdî di sala 2016an de dest bi weşanê kiriye. Kovar li ser derûnnasiyê hûr dibe. Ji 4 mehan carekê diweşe û heya niha 11 hejmarên çapkirî û yek jî bi awayê online/pdf derxistiye. Herî dawî bi awayê çapkirî hejmara xwe ya 11an derketiye pêşberî xwendevananên xwe. Di sala 2020an de 3 hejmar belav kiriye.

| Hejmara Kovarê | Dema Weşanê | Tevahî Çend Nivîs | Kurdî | | | Tirkî | Îngîlîzî | Zimanê Din |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | Kurmancî | Soranî | Zazakî | | | |
| 10 | 01 /2020 | 19 | 17 | | 2 | | | |
| Taybet | 05 / 2020 | 11 | 10 | | 1 | | | |
| 11 | 09 / 2020 | 17 | 15 | | 2 | | | |

**Kunyeya Kovarê:**

**Nav:** Sînemaya Serbixwe

**Derbarê Kovarê de:**

| Hejmara Kovarê | Dema Weşanê | Tevahî Çend Nivîs | Kurdî | | | Tirkî | Îngîlîzî | Zimanê Din |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | Kurmancî | Soranî | Zazakî | | | |
| 3 | Salê du caran | 30 | 27 | 1 | 1 | 1 | | |

**Kunyeya Kovarê:**

**Nav:** Temaşe

**Derbarê Kovarê de:** Bi giştî Sînemaya Kurdî û sînemaya cîhanê ye.

| Hejmara Kovarê | Dema Weşanê | Tevahî Çend Nivîs | Kurdî | | | Tirkî | Îngîlîzî | Zimanê Din |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | Kurmancî | Soranî | Zazakî | | | |
| 1 | Demsalî | 19 | 17 | 1 | 1 | | | |
| 2 | Demsalî | 21 | 15 | 3 | 3 | | | |

**Kunyeya Kovarê:**

**Nav:** Vejîn

**Derbarê Kovarê de:** Kovara xwendekarên Kurdolojîyê ye. Ji ber ku kovara xwendekaran e jî bi avayekî sîstematîk dernakeve. Kovara me bi sê zaravayên(kurmancî, zazakî, soranî) Kurdî weşanê dike. Ji kerama xwe li tabloya jêrê tenê çend nivîs û bi kîjan zimanî hatine nivîsîn binivîsin. Ne hewceyê navên nivîsan û hurguliyên din binivîsin tenê jimar bes in.

| Hejmara Kovarê | Dema Weşanê | Tevahî Çend Nivîs | Kurdî | | | Tirkî | Îngîlîzî | Zimanê Din |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | Kurmancî | Soranî | Zazakî | | | |
| 7 | 15.05.2020 | 10 | 8 | 1 | 1 | | | |

**Kunyeya Kovarê:**

**Nav:** Zend

**Derbarê Kovarê de:** Kovara Zend yek ji wan kovarên pêşeng e ku di warê lêkolîn û zanistê de li Bakur derketîye. Zendê bi dirêjahîya temenê xwe yê weşanê mêvandarî li gelek rewşenbîrên kurd kirîye û bûye cîgeha nîqaşên zanistî li ser ziman û edebîyat û dîrok û çanda kurdan. Zend yekem car di sala 1994an de du hejmarên wê wek hejmarên ceribandinê derdikevin. Piştre di sala 1996an de bi awayekî perîyodîk dest bi derketinê dike û heta 1998an 6 hejmarên wê derdikevin. Ji ber şert û mercên wê demê 6 sal navber dikeve weşana Zendê û di sala 2004an de dîsan derdikeve. Di sala 2004an de ji ber hin meseleyên resmî statûya wê ya resmî ji kovarê derbasî rêzepirtûkê dibe. Ji 2004an ve heta niha 27 hejmar derketine. Zend ji 1994an heta niha 35 hejmar derketîye. Zend hîna jî ji hêla Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ve salane du hejmar tê derxistin. Hejmareke wê biharê û ya din jî payizê tê derxistin.

| Hejmara Kovarê | Dema Weşanê | Tevahî Çend Nivîs | Kurdî | | | Tirkî | Îngîlîzî | Zimanê Din |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | Kurmancî | Soranî | Zazakî | | | |
| 27 | 2020 | 10 | 9 | 1 | | | | |